# “Li dijî qirkirina jin, bibe dengê xweparastinê”

Pêngava Enternasyonal ji
Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ)

Ji 8.3.2024, roja jinên cîhanî, heta 3.8.2024 an, salvegera 10. ya fermanê, em dengê xwe li dijî qirkirina jin û ji bo xwe parastinê bilind bikin.

Di vê pêngavê de em deng, îmzeyan û beşdariyên ji jin û rêxistinên jinan berhev bikin.

Hûn dikarin di rûpela din de di derbarî vê de zêdetir agahiyan bixwîn in. Li gor wê em bi hêvî ne ku hûn bi rêbazên dewlemend wek( dîmen, wêne, sitran, helbest,çalakî ...hwd) tevlî vê pêngavê bibin.

Şengal, Adar 2024

**Agahiyen, zêdertir**
email: tajesengal.2016@gmail.com
telefon: +964 (0)7836424655
malper: www.taje-shengal.com

# Ji bo Jinên Cîhanê:

Em Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) silav û rêzên xwe ji hemû jinên cîhanê yên ku tekoşîn dikin û li berxwe didin re dişînin. Ji bo hemû jinên ku li dijî şideta fizîkî û fikrî serî hil didin. Ji bo hemû jinên ku ji bo jiyanek azad, xwe rêxistin dikin. Ji bo hemû jinên ku jiyana xwe, welatê xwe û çanda xwe,  diparêzin.

Di roja îro de, şerên hovane û şideta dij mirovî tê jiyan kirin. Em jin, rastî lêdan, destavêtinê hatin, em hatin firotin, kuştin û şewtandin. Welatên me hatin dagir kirin û xweza hat wêran kirin. Lê li hemberî her êrîşê, berxwedana me û têkoşîna me li dijî şer, şidet û qirkirina jin roj bi roj mezintir dibe. Ev yek hêvî û hêzê dide me. ji ber li her derê êş û berxwedana me yek e.

Sala 2024 ji bo me jinên Êzidî salek taybet e. Salvegera 10. a jenosîd û femîsîda ku ji milê çeteyên  DAIŞ ê li ser Şengalê pêk hatiye. Di 3.8.2014 de, bi deh hezaran mirovên Êzidî hatin kuştin, hatin dîl girtin û hatin kole kirin. DAIŞ zarokên Êzidî neçar kirin ku bibin leşkerên zarok. Her wiha, bi sed hezaran mirov ji Şengalê hatin koçber kirin. Cihên me yên pîroz hatin teqandin û bi dehan xanî hatin xera kirin. Lê, bi sedan malbat li serê çiyayê Şengalê man, rûxmî hemû zor û zehmetî, dest ji axa xwe bernedan, wan çek rakirin û li dijî DAIŞ ê li berxwe dan. Wan ji bo rizgarkirina Şengal şer kirin. Her wiha hêzên xwe yên parastinê  Yekineyên Berxwedana Şengalê (YBŞ) û Yekîniyên Jinên Şengalê (YJŞ) ava kirin.

Bêguman di hemû komkujî û fermanan de herî zêde jin bûne qûrbanî. Bi riya helandin û qetilkirina jinan armanc ew e ku nasname, çand û baweriya civakê bê tune kirin. Di fermana 2014 de, jinên Êzidî ku dîlgirtî ketin destê DAIŞ de, ew  rastî destavitainê hatin, wek kole li sukan hatin firotin û bi çeteyên DAIŞ ê re hatin zewcandin. Heta îro, 2.941 mirov di destê DAIŞ de ne, hejmara herî zêde ji wan jin û zarokan in. Ev êrîşên jenosîd û femîsîdên dijî civaka li Şengalê, birînên zehmetin hîna di dilên me hemûyan de ye. Em dibêjin ev êrîş, êrîşên ji sîstema şideta baviksalarî bûn û êrîşên dijî hemû jinên cîhanê bûn.

Em rast nabînin ku heya îro DAIŞ û hevkarên wan dewleta Tirk, PDK yên ku jenosîd pêk anîn di dadgehek navnetwî de nehatine dadgeh kirin. Ji ber vê yekê êrîşên sîstematîk dijî civaka Şengal didome. Di 3.8.2014, parastina Şengal di bin kontrola PDK ê de bû. Lê, dema êrîşên DAIŞ ê despêk kir, 12.000 pêrşmergên PDK bê ku yek fîşek biteqînîn reviyan û civaka Şengalê radestî çeteyên DAIŞ ê kirin. Em dixwazin bepirsên fermanê bên dadgeh kirin, kesên jenosîd dijî civaka me pêk anîn bên lêkolîn kirin û dadgeh kirin.

Jenosîd û femîsîda 3.8.2014 an bû sedem di civaka me de gelek tiravma û windarin bê jiyan kirin. Lê îro ev ax cihê berxwedana me ye. Gelek şervanên me ji bo parastina welatê xwe û civaka xwe j iyana xwe ji dest dan, şehîdên me her dem ronahî û hêviya me ne.

Piştî sala 2014 an, civaka li Şengalê rêxistina xwe ava kirin, carek din ji nû ve jiyana xwe li ser fikir û felsefa RÊBERÊ gelan ABDULLAH OCALAN despêk kirin. Wek jinên Êzidî bi felsefa JIN JIYAN AZADÎ me Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) ava kir. Îro, bi serbilindî, em dikarin bêjin dayîkên me pêşengê berxwedana Şengalê ne. Em meclîsên xwe rêxistin dikin, milê çandî, tendirustî, aborî, ragihandin û dîplomasî kar dikin.

Dîroka me, dîroka tekoşîn, berxwedanê ye di heman demê de dîroka 74. fermanan e. Em ji dîroka xwe fêr bûn ku em nikarin parastina xwe ji hêzên derve hêvî bikin. Ji ber vê, piştî fermana 2014 an me hêzên xwe ya parastinê YBŞ, YJŞ û Asayîşa Êzidxanê ava kir.YJŞ rûmeta me ye. Îro wek jinên Êzidî, em parastina xwe dizanin. Ev tolhildana me li dijî şidet û êşa me ye.

Piştî deh sal ser ferman û femîsîdê re derbas bûn, hîna jî êrîşên dijî civaka me berdewam in. Dewleta Tirk bi hevkariya PDKê êrîşên hewayî li ser hêzên me yên parastinê û li dijî sivîlan pêk tîn in. Ji sala 2017 an bi dehan keç û kurên Êzidî di van êrîşên hewayî de jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûn. Her wiha, dewleta Iraq û PDK ê bi zexta diplomasî û şerê taybet hewl didin ji bo sîstem û rêxistina me ya rêveberiya xweser li Şengalê bi riya hevpeymana 9 ê Cotmehê tune bikin.

Ji bo hemû gelên bindest , civak û baweriyan, mafê xwe yê parastinê li dijî jenosîd û femîsîdê heye. Li ser vî esasî em dibêjin, li Şengalê, parastina civak û jinên Êzidî, YBŞ, YJŞ û Asayîşa Êzidxan e, ev yek mafek rewa ye .

Wek TAJÊ û YJŞ, em dijî neteweperestî, olperestî û taybet dijî zayendperestî tekoşîn dikin ji bo dema pêş carekî din jenosîd û femîsîd dijî jinan, civakan yan baweriyan pêk neyê. Ji bo avakirina demokrasî, azadî û aştiyê, dema ku pêşegtiya jin di milê xwe rêxistin kirinê de, her wiha îrada azad nebe ne pêkan e ku pêk were.

Bersiva herî rast dijî komkujî û şideta dijî jinên Êzidî, hevgirtin û rêxistina hemû jinên cîhanê ye.

Ji ber vê, em dibêjin di sala 2024 an de, em tekoşîn û dengê xwe bi hev re li dijî qirkirina jin û ji bo  parstina xwe bilind bikin.

**Daxwazên me:**

**1. Qirkirina jin (femîsîd) sûcê şer e, qirkirina jin (femîsîd) bê nas bikin, hamû sûcdar û hevkarên wan werin dadgeh kirin.**

**2. Mafê jinan ji bo parastina jiyana xwe, welatê xwe û çanda xwe ji milê hemû civakan û saziyan ve were nas kirin.**

**3. Fermana 3.8.2014 an ku ji milê çeteyên DAIŞ ê ve pêk hatî were nas kirin. Hamû sûcdar û hevkar, wek DAIŞ, PDK, dewlata Tirk, dewlata Iraq werin dadgeh kirin.**

**4. Îrada civaka Şengalê, rêverberiya xweser, her wiha YBŞ , YJŞ û Asayîşa Êzidxanê were nas kirin.**

**5. Hemû êrîşên li ser Şengalê, taybet êrîşên hewayî ya dewleta Tirk, dawî lê were anîn.**

Ev pêngav, ji 8.3.2024 roja jinên cîhanî dest pê dike heta 3.8.2024 an salvegera 10. ya fermanê dewam dike. Em deng, îmzeyan û beşdariyên ji jin û rêxistinên jinan berhev bikin û em ji bo hemû jinên cîhanê bang dikin:

Werin em bi hev re, bi rûhê JIN JIYAN AZADÎ dengê xwe bikin yek, em dengê xwe li dijî qirkirina jin û ji bo xwe parastinê bilind bikin.

Em dixwazin bi hev re berpirsên qirkirina jin dijî jinên li Şingalê û her cihek cîhanê ku qirkirina jin tê jiyan kirin sucdar bên dadgeh kirin.

Şengal, Adar 2024
**Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ)**